Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1185 | 10-Tîrmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Bi zarokên pêşerojê re wê huner pêşbikeve’





**Hîlala Zêrîn ya Kantona Efrîn û Şehbayê di betlaneyên dibistanan de perwerdeyên hunerî ji bo zarokan vekirin.**

**Endama Komîteya Perwerdeyê a Hîlala Zêrîn a Kantona Efrîn û Şehbayê Esme Hido têkildarî perwerdeyên xwe yên havînê diyar kir ku di betlaneyê de perwerdeyên hunerî ji bo zarokan hatine vekirin û hefteyê du caran perwerde tê dayîn.**

**Esme Hido li ser naveroka perwerdeyê got: “Beşên tembûr, şano, govend û stranan hene û li gorî xwesteka zarokan e. Di koma stranan de 20 zarok hene, her wiha komeke stranan li bajarokê Ehdasê jî hatiye vekirin, li wir jî 20 zarok in.”**

**Mamosteya govendê Zêneb Îbo jî got da ku zarok dema xwe vala derbas nekin, di betlaneyê de xwestin perwerdeyê ji bo zarokan vekin.**

**Zêneb Îbo destnîşan kir ku zarok bi rêya hunerê wê kevneşopên xwe nas dikin. Zênebê anî ziman ku zarok bi kêfxweşiyeke mezin dikevin perwerdeyê û wiha got: “Zarok dixwazin fêrî huner û çanda xwe bibin. Lê li Şehbayê malbat zehmetiyên madî dikişînin, ji ber vê jî berê gelek zarokan didin kar. Em hewl didin vê yekê jî çeraser bikin.”**

**Zênebê di dawiyê de got: “Em dixwazin zarok kevneşopên xwe û çanda bav û kalan nas bikin, ji bo ku di dema pêş de zarok bikarin cihê xwe di hundir hemû projeyan de bigirin.”**

**Zaroka bi navê Newroz Elîko jî diyar kir ku di betlaneyê de xwest bikeve perwerdeya Hîlala Zêrîn û di beşa govendê de xwe bi pêş bixe.**

**Her wiha zaroka bi navê Rojîn Memo jî got hezkirina wê ji govendê re heye, ji ber vê jî cihê xwe di koma govendê de girtiye.**

# Di rewşên zehmet ên koçberiyê de asta yekem wergirt



Li kêlek rewşên koçberiyê yên zehemet, xwest ku di wergirtina bawernameya zanistî de li ser asta Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ya yekemîn be.

Piştî dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê di 2019’an de Serêkaniyê dagir kir bi hezaran xelkê wê koçber bûn û li kampên Rêveberiya Xweser ava kirine bi cih bûn. Ji wan kampan kampa Serêkaniyê ye. Edle El Hemdoş û malbata wê ji nava koçberên di bin konan de dijîn.

Edle xwendina xwe ya navîn, piştî bajarê wê Serêkaniyê hat dagirkirin, li Hesekê bi dawî kir. Hezkirina xwe ji zanistê re û hêviya xwe ya mezin ku bibe bijîşk, hişt ku xwendina xwe bi israr dewam bike. Mîna her ciwanekî/ê di kampê û derveyî wê de xwendina bingehekê dibînin. Edle tevlî dibistana kampê bû ji bona ku xwendina xwe temam bike. Li binê konekî ku nîşaneyên demê lê dixuya, dîwarên wê qelişî ne û reng guheriye, wê di dema xwendina xwe ya refa 1 û 2 ya amadehî de astên baş bi dest xistin û dest bi amadekariya pêşkêşkirina bawernameya dibistana amadehî kir.

Di bin konê ku 11 ferd ji malbata Edlê hene de, hêmanên jiyanê yên herî kêm tune ne ku germa û serma naparêze. Edle serketineke mezin bi dest xist. Edle li ser asta Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê 1097 ji eslê 1100 pile wergirt û bi wê re bû ya yekem. Li ser vê encamê ku Edle bi dest xistî got wê li hember tevahî astengiyên ku îsrara wê ya temamkirina xwendinê zêde kir û hêviya xwe ku bibe bijîşk da ku alîkariya niştecihên kampê û xizanan bike, pêk bîne.

Edle hêvî kir ku ev encam li bajarê xwe yê Serêkaniyê wergirt, wê demê kêfxweşiya xwe mezintirîn bû.

Edle spasî malbata xwe kir ku moral da wê û rewşên guncaw ên xwendinê tevî zehmetiya jiyana di hundirê kon de ava kir.

## bi kamîreya Zana Roj



# Bi şêwekariyê hestên xwe îfade dike



Şêwekar Ekrem Bekir got, şêwekarî parçeyek ji jiyana wî ye, bi rêya wê hestên xwe îfade dikim û nefesê dîstîne.

Şêwekar Ekrem Bekir ji bajarê Hesekê ye. Sala 2007`an ji Fakulteya Ragihandinê ya Zanîngeha Şamê derçûye. Ji destpêka 2011`an ve bi rêya berhemên xwe, hûrguliyên herî hesas ên jiyanê rave dike.

Bekir, bêhna xwe di hola xwe biçûk de vedide. Li ser dîwarên wê, berhemên xwe, pêdiviyên xêzkirinê wek pênûs, text û caw daliqandine. Ji wê holê bêhna rengan tê.

Bekir der barê behreya xwe de wiha axivî: “Hîna biçûk bûm min dest bi xêzkirinê kir. Lê belê sala 2011`an bi awayekî akademîk min xêz kir. Destpêkê protre, xwezaya bêdeng, xêzkirina realîst şêwazê min bû.”

Bekir wiha domand: “Herî zêde bi rengên zeytî û pênûs li gorî 2 teknîkên cuda xêz dikim. Geh bi pênûsan, grafîk û komirê. Geh bi rengên zeytî. Bingeh û rêgezên taybet ên her rêbazekê hene.”

Bekir heta niha, gelek tablo hazir kiriye. Tevlî gelek pêşangehên xwecih bûye. Lê belê ji ber şert û mercên herêmê, nekariye tevlî pênagehên herêmî û navneteweyî bibe.

Bekir nêrîna xwe derbarê xêzkirinê de wiha rave kir: “Nêrîna her hunermendekê/î yê taybet heye. Hinek xêzkirinê wek hewsekê yan jî bedewiyekê bi nav dikin. Ew jî girêdayî nêrîna her kesekî/ê ye. Ji bo min, xêzkirin wateya gelek tiştan dide. Ji bo min, ji pîşeyekê wêdetir, rêbazeke jiyanê ye. Ez hestên xwe bi rêya wê rave dikim. Bêhna xwe pê vedidim. Cîhanê rengan, cîhaneke xweşik e. Tenê di nava tablo û rengên xwe de vedihesim. Dikarim bêjim, afrînariya serbest di bin navnîşana bedewiyê de ye.”

# FERHENGA BIWÊJAN

**Li ser eşkerebûn û eşkerekirinê**

**Av lê zelal bû:**
- Xirabiya wî xuya bû.

**Binê wî kola:**
- Agahiyên li cem tev jê girtin; xefên wî, diziyên wî tev zanîn.

**Bi ser avê ketiye:**
- Çîrok eşkere bûye; tiştek di binê cilê de nemaye.

**Da binê darê:**
- Her tişt eşkere kir; tiştên bi dizî eşkere kirin.

**Da dest:**
- Eşkere kir.

**Dahol di bin berikê de nayê kutan:**
- Tiştek bi dizî namîne; hinek tişt bi dizî nabin; hinek tişt zû eşkere dibin.

**Da navê:**
- Tişta di dilê xwe de got; her tişt eşkere kir.

**Dilê xwe jê re vekir:**
- Derdê xwe, daxwaziyên xwe, tiştên di dilê xwe de tev jê re gotin.

**Diz û xwediyê malê bi hev hesiyan:**
- Her tişt eşkere bû.

**Ez li bin zimanê wî geriyam:**
- Min xwest bidim axaftin; min xwest ya di dilê wî de bizanim.

**Guhê mezin nayê veşartin:**
- Kêmayiyên mezin nayên veşartin.

**Hebana xwe weşand:**
- Tiştek di dilê xwe de nehişt; tiştên di dilê xwe de tev gotin.

**Hêka xwe kir:**
- Bi heman wateyê.

**Ji golikê re gotin; emê poçika te jê bikin lê ji ti kesî re nebêje; golikê got; ma ez nebêjim wê nebêjin ka poçika te:**
- Nayê veşartin; wê eşkere bibe.

**Ker bêdeng nazire:**
- Hin tişt bi dizî nabin.

**Kirasê wî li serê wî gerand:**
- Kiryarên wî tev eşkere kirin.

**Kîsê xwe vala kir:**
- Tiştek di dilê xwe de nehişt; tiştên di dilê xwe de tev gotin.

**Kumê keçeliya wî ket:**
- Xefên wî eşkere bûn; diziyên wî eşkere bûn; durûtiya wî eşkere bû; rastiya wî derket meydanê.

**Kum ket keçeliya wî derket meydanê:**
- Bi heman wateyê.

**Li devê wî geriya:**
- Xewest dilê wî bizane; xwest niyeta wî fêm bike.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# ‘Azadiya Rêber Apo armanca me ya sereke ye’




KCDK-E’yê konferansa xwe ya dema navber temam kir. KCDK-E’yê diyar kir ku qirkirina gelê Kurd tê armanckirin û got: “Azadiya Rêber Apo armanca me ya sereke ye.”**R-3**

# Desthilatdariya Hegemonîk a Navendî

**Di çarçoveya mijara me ya bingehîn de danasîna teorîk a heyatî divê der barê desthilatdariya hegemonîk a navendî de hebe. Teoriya sereke ya karibe rewşa gelekî li ber qirkirinê zelal bike, teoriya desthilatdariya hegemonîk a navendî ye.R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1185 | 10-Tîrmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# DAGIRKERIYA TIRK DESTKEFTIYÊN GELÊN KURDISTANÊ DIKE ARMANC

Bi bêdengiya hikumeta Îraqê dagirkeriya Tirk sewqiyata leşkerî ya giran û êrişên xwe yên li dijî Başûrê Kurdistanê dewam dike û şer ber bi qonaxeke nû ve dibe. PDK’ê jî ji dagirkeriyê re zemînê amade dike û ji bo vê yekê hemû derfetên xwe seferber kiriye. Li aliyekî rêyên fermî ji artêşa Tirk a dagirker re vedike û kontrolê bi temamî ji artêşa Tirk re hiştiye, li aliyê din jî bi rêya ragihandina xwe Tevgera Azadiyê reş dike. Tevî hemû êriş û planên mezin jî, Gerîlayên Azadiyê berxwedaneke bêhempa didin meşandin û êrişên dagirkeriyê têk dibin.**R-5**







# Nexweşiya Laşmaniya dîsa belav dibe



Rêvebera beşê nexweşiya Laşmaniyayê Hêvîn Mîrza da zanîn ku wan bi alîkariya hinek rêxistinên tenduristiyê û keda ku hatiye dayîn li pêşiya belavbûna nexweşiya laşmanyayê heyanî astekî girtine. Lê ew bi tirs in ku ev nexweşî mayînde bibe.**R-6**


# Tabloya navdar “Qêrîn”



Tabloya Qêrîn yek ji tabloyên herî navdar yên cîhanî ne, ku di sala 1893’an de ji aliyê wênesaz Edvard Munch ve hate xêzkirin. Tê de rewşeke derûnî a xerîb û xerab a ku nivîskar têre derbas bûyî nîşan dide.**R-7**

# Dayika mezin welat e!

Welat, ji bo mirov erd e, hewa ye, dar, ber, daristan, çiya… û hwd. Yanî ji bo mirov her tişt e. Ji xwe pêşiyên Kurdan jê re gotine war. War û welat hema bêje tê heman maneyê. War, parçeyek ji hemû welatî ye.**R-6**




Jin çi ji mêrê desthilatdar hêvî dike! — Nehîr pale — R-2
Aştiya Erdogan — Zekî Bedran — R-5
Bikaranîn-bikarneanîna zimanê Kurdî — Farûk Sakik — R-5
Girîngiya perwerdê ji bo civakê — Rohat Bulut — R-6
Desteyên Çandê û Siyaseta Rewşenbîrî — Kemal Necim — R-7

# Derhênera kurd Hêlîn: Divê jin di sînemayê de bi wêrek û bawer bin

Derhênera kurd Hêlîn Çelîk bal kişand ser têkiliya jinan û sînemayê û got: “Me têgeha ‘jin’ di civakê de fetisandî ye, heke jin xwe eşkere bikin û baş bîne ziman, li şûna mexdûriyetê dê xwedî hêz bin.”

**Navenda Nûçeyan**

Weke her qadê, jin di qada sînemayê de jî kêm tên temsîlkirin û hejmara derhênerên jin gelek kêm in. Wekî her qadan di qada sînemayê de jî desthilatdariya mêr heye û pergala kapîtalîst her roj pirtir derfetan ji wan re diafirîne. Derhênara kurd Hêlîn Çelîk ku ev ji 8 salan zêdetire derhêneriyê dike û heta niha 2 belgefîlmên bi navê “What the Wind Took Away (Tiştê Ku Ba Birî)” û “Anqa (Sîmir)” çêkiriye. Hêlîn Çelîk niha li paytexta Avûstûryayê Viyanê dijî û karê xwe yê esil terapîstiya hûnerê jî berdewam dike. Her wiha Hêlîn Çelîk niha li ser belgefîlma xwe ya sêyemîn dixebite.

**Hêlîn Çelîk li ser têkiliya jinan û sînemayê û derhêneriya jinan ji me re axivî**

Hêlîn Çelîk diyar kir ku ji ber zextên civakê yekemîn têkoşîna wê destpêkirina karê vegotina çîrokan bû. Hêlîn Çelîk anî ziman ku wê ji xwe bawer nedikir û her tim xwe kêm didît. Hêlîn Çelîk da zanîn piştre hîn bûye ku ji bo vegotina çîrokekê divê ew xwedî materyalan be û wiha got: “Ji ber ku em weke jin di civakeke mêrsalar de mezin dibin, her tim hewl didin xwe bigihînin asta ‘ka mêrek dikare çi bike?’. Ji bo min pirsgirêka herî mezin tunebûna materyalan bû û ka ez ê çawa bibim derhêner. Ji ber ku ez jin im, ez jineke kurd im û malbata min a ku di têkoşîna siyasî de çalak bûye, min dît û fam kir ku bi



rastî gelek materyalên cuda hene. Ji ber vê yekê min fêm kir ku materyalên min ji xwe jin bûn, hebûna jinek kurd e û ji xwe ew jî ji bo vegotina çîrokekê bes e.”

**‘Têgeha jinê di civakê de hatiye fetisandin’**

Hêlîn Çelîk da zanîn ku paşê hewce bû ku ew divê ji bo zimanê xwe formeka sînemayî peyda bike û bala wê di heşt salên dawî de li ser çarçovekirin û jinûve pejirandina wateya jinbûnê bû, lewma wê giranî daye ser temsîlkirina jinan û çîrokên jinan. Hêlîn Çelîk diyar kir ku ew zêdetir li ser beşa têgehên “jinê” rawestiyaye û wiha dirêjî da axaftina xwe û got: “Ji ber ku li gor fikra min me têgeha ‘jin’ di civakê de fetisandî ye. Ji ber vê yekê, bi taybetî di van deh salên dawî de, min giranî da ser hizrên guhertina nûnertiya jinan a di civakê de. Bi dîtina min pirsgirêka herî mezin a ku me her tim dîtiye ew e ku jin her tim weke mexdûr tên nîşandan. Di destpêkê de min zehmetî kişand ku ji vê çarçoveya heyî xilas bibim û bi perspektîfeke cuda nêzî têgeha jinbûnê bibim. Ji ber vê yekê min formên alternatîf ên çîrokbêjiyê peyda kir da ku wê di hişê xwe de asteng bikim. Lê di heman demê de min qadek çêkir da ku jina ku ez pê re dixebitim bi awayekî din bi xwe re rû bi rû bimîne, ango xwe bibîne. Ji ber ku mixabin weke min di serî de jî got, me jinan portreya jinê di nava vê civakê de veşartiye. Ji ber vê yekê min hewl da ku cihek din biafirînim ku tê de bikaribim bi lehenga xwe re rû bi rû bibim. Tişta ku min bala xwe dayê ev e, ku jin ji bo ku bi xwe re rû bi rû bimîne divê di vegotina xwe de israrek mezin nîşan bide. Jin heke xwe eşkere bikin û îfade bikin, li şûna mexdûriyetê dê xwedî hêz bin.”

**‘Jin ji aliyê civakê ve hatine mehkûmkirin’**

Hêlîn Çelîk behsa belgefîlma xwe ya bi navê “Anqa (Sîmir)” kir û da zanîn ku dema wê dest bi çîroka vê belgefîlmê kir, tişta herî zêde bala wê kişandî jina ku lehenga çîroka wê ye û li Urdunê rastî wê hatiye. Hêlîn Çelîk destnîşan kir ku ew jin bi sûcên cîhanê yên herî hovane re rû bi rû maye û axaftina xwe berdewam kire û got: “Divê malbat, di cîhanê de ji bo jinê cihê herî ewle be. Lê jin di malbatê de bi sûcên gelek dijwar re dimîne. Heke malbata ku cihê herî ewleye ji bo jinê, hilweşiya be, jinek dê çawa xwedî qadek ewle be? Ew tişt ji min re tiştekî pir bibandor bû. Ev bêmalî, ne bêmalî ya bi awayekî fîzîkî ye, bêmaliya bi avahîyekî bihest û mental e. Ev jin tenê bi sûcên hovane re rûbirû maye, di heman demê de jî ji aliyê civakê ve hatiye mehkûmkirin. Şansekî wan ku jiyaneke cuda bijîn tune ye. Ew her tim dîn û qurban bûn.

**Ev yek manîfesto bû**

Di belgefîlm de 3 jin hene. Ew jî hînî vegotina mexdûriyetê bûne û vê yekê jî bandorek mezin li ser min kir. Ji bo ku ez qadeke nû biafirînim vê yekê jî motîvasyona min bilind kir. Min xwest bi awayekî cuda bi xwe re rûbirû bimînin ku bizanin ew ne qûrban in, ji mêrtiyê bi hêztir in. Ew lehengên wisa ne ku ji sûcên fîzîkî, derûnî, hestiyarî sax derketine. Lehengê belgefîlm jî di dawiyê de dibêje ku ‘Ez heme’. Cara yekemîn bû ku wê jinê ev wêrektî nîşan dida. Ez vê yekê weke manîfestoyekê dibînim.”

**‘Wêrek bin û bi xwe bawer bin’**

Derhênera kurd Hêlîn Çelîk bang li jinên ciwan ku dixwazin derhêneriyê bikin kir û axaftina xwe wiha bi dawî kir û got: “Ez dixwazim vê wêrektiya ku di ciwaniya min de kêm bû bidim hemû sînemagerên ciwan. Bila bizanin û ji xwe re bibêjin ku ‘Wêrekiya min bes e, materyalên min têra min hene ku çîroka xwe vebêjim. Ez ne qurban im. Tiştê ku ez dixwazim bibêjim ji min çêtir kes nikare bêje’. Yên ku nû dest pê dikin tenê hewce ye ku wêrek bin, ji xwe bawer bikin û rêwîtiya xwe bidin destpêkirin. Ji ber ku çîroka me jin e û ji vê erdnîgariyê tê. Tişta ku me jinan ji bo xwe kiriye armanc jixwe ji bo afirandina çîrokekê bes e.”

# ‘Hevpeymana civakî ya jinan di têkoşîna jinan de gavek dîrokî ye’

**Navenda Nûçeyan**

Seroka Desteya Jin a Rêvberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Edalet Omer bal kişand li ser hevpeymana civakî ya jinan ku duh ji bo reşnivîsa wê komîteyek ji 30 kesan hat diyarkirin û got: “Di têkoşîna jinan de gavek dîrokî ye.”

Meclisa Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê têkildarî hevpeymana civakî ya jinan civîneke berfireh lidarxist. 130 jinên ji pêkhateyên cuda beşdarî civînê bûn û di dawiya civînê de ji bo reşnivîsa hevpeymanê komîteyek teng a ji 30 jinan pêk tê hat avakirin.

Seroka Desteya Jinan a Rêvberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Edalet Omer têkildarî civîna ku hat lidarxistin û di têkoşîna jinan de girîngiya hevpeymana civakî ya jinan ji ajansa me re axivî.

**‘Bi hevpeymana civakî ya jinan re wê destkeftiyên jinan bên parastin’**

Edalet Omer da zanîn ku şoreşa rojava bi rengê jinê deng vedaye û wiha axaftina xwe domand: Ji destpêka şoreşê çawa ku bi rengê jinê hate naskirin û berbelavî cîhanê tevahî bû. Lidarxistina civîneke bi vî rengî gelek girîng bû û bi taybet jî piştî dayîna hevpeymana civakî a giştî û ji bo parastina nirxên şoreşa jin gavekî serkeftî û nûbû di qada têkoşîna jinê de. Em dikarin bêjin ku hevpeymana civakî ya giştî ji bo gelek dozan kar û xebat dike. Lê hevpeymana civakî ya jin wê ji bona doza jin be.”

**‘Armanc rêxistin û dezgehên jinan di bin sîwanekê de anîna gel hev e’**

Edalet Omer di berdewama axaftina xwe de balkişand li ser girîngiya yekîtiyê û wiha got:“Gelek rêxistin, tevger û partiyên jinan hene li qadê. Lê pêwistî hate dîtin ku sîwanek hebe van rêxistinan bike yek. Ji bo wê jî di 2019’an de Meclisa Jinan a Bakur û



Rojhilatê Sûrî hate avakirin. Zêdetirî 50 tevger, partî û dezgehê jinan cihê xwe di vê meclisê de girtin. Heya astekê ked hat dayîn û xebat hat meşandin. Lê li gor pêvajoyê kêm ma. Rêxistinên nû hatin avakirin piştî 2019’an, lewma pêwistî hate dîtin ku ev meclis civînek berfireh lidabixe, pirsgirêk û rewşa jinan nîqaş bikin û di bin sîwanekê de bibin yek. Armanc ji civînê komîteya biçûk a ji 30 kesan pêk tê were avakirin da ku di demên pêş de li hev rûnên û bi pênûs û mejiyê jinan reşnivîsa hevpeymanê were nivîsandin. Gelek destkeftî û serkeftin di vê pêvajoyê de hatine bidestxistin. Ev deskeftî ger em di riya hevpeymana civakî ya jinan de ku hemû rêxistin û dezgeh di bin sîwanekê de bikin yek wê demê dikare were parastin.”

**‘Ji bo pêşeroja Sûriyê jî gavek dîrokî ye’**

Edalet Omer a di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser têkoşîna jinan a li Sûriyeyê û destnîşan kir ku ev hevpeymana civakî ya jinan wê bandorê li têkoşîna giştî jinên Sûriyeyeyê bike û got: “Li Sûriyayê yekîtiya jinan hebû, di sala 2016’an de ji aliyê rêjîmê ev yekîtî hate girtin. Xwest li şûna vê yekîtiyê yekîtiyeke olperest ava bike. Li herêmên dagirkirî jî dewleta tirk bi dagirkeriya xwe sûcên der mirovî li dijî jinan pêk tîne. Armanca me ew e ku em herêmê ji dagirkeriya dewleta tirk rizgar bikin.

Hevpeymana civakî ya jinan gaveke serkeftî û dîrokî ye ji bona ku di pêşeroja Sûriyeyê de jin cihê xwe di destûreke demokratîk de bigre.”

## Ji Pênûsa Jin

### Jin çi ji mêrê desthilatdar hêvî dike!

Nehîr Pale

Jin li benda mêr dimîne, hêviyê jê dike û çarenûsa xwe dixin destê wî de! Em di civakeke zayendperest de dijîn, hişmendiya desthilatdarî û kolekirinê heyanî hestû çûye, mejî û dilê her kesî gemar kiriye. Êdî jin gihandina asta ku aşiqê celadê xwe bibe. Li ser asta cîhanê rojane bi dehan jin têne qetil kirin. Ev rewş her tim berdewam dike. Tişta mêr li ser cîhanê ferz kiriye ne jiyan e, ew bi xwe mirin e. Bi taybet di mijara jinê de zayendperestiyeke gelekî kûr heye, mêr bi hişmendiya xwe re nakeve nava nakokiyan de, şaş jî nabîne û li ser jinê jî ferz dike.

Jin di zaroktiyê de çarenûsa xwe dixin destê bavê xwe, piştî ku mezin dibin û dizewicin êdî radestî hevjînê xwe dikin. Em di sedsalekê de ne ku rojane jin têne kuştin û bûyerên tûndiya li ser jin jî dawî lê nayên. Di vir de mijara ku dibe zû dawî lê were teqlîdkirina jin a ji mêran re ye. Jin hewl didin ku li ser hişmendiya mêr jiyana xwe bihûnînin. Her çiqasî mêr li pêşiya çavên wan tûndiyê li jinê bike jî, wê işkence bike yan jî bikuje, dîse tedbîrên xwe li hemberî mêr nagirin. Jina tûndî lê tê kirin nahizire ku di têkiliya xwe ya bi mêr e divê bi tedbîr be, xwe birêxistin bike û berpirsyartiya xwe rabike.

Em pir rehet di bin navê hezkirinê yan jî kevneşopiyan de xwe dixin nava destê mêr de. Mêr ji xwe her tim jinê lewaz dibîne. Dema bixwaze wê kêfa xwe pê bike, weke xizmetkar bikar bîne, lêbide, wê îhanet bike, li ser bizewicê, dev ji wê berde. Eger em dibînin bi rojane jin dikevin van rewşan de, çima em tedbîrên xwe nagrin? Heyanî niha dema ku buyerek biqewimê jin tê sûcdar kirin. Mêr li ser hevjîna xwe bizewic wê bibêjin jin bi aqilê wî leyîstiye û bûye sedema ku li ser hevjîna xwe bizewicê. Mêr jinê bikuje wê bipirsin gelo wê jinê çi kiriye? Kesek mêr lêpirsîn nake û nabêjin sedema ku jin dighîjê vê rewşê mêr bi xwe ye. Em çima xwe dixin xefka mêr de? Hêvî jê dikin ku jiyaneke birûmet layiqî me bibîne. Mêrekî 60 salî pir rehet dikare bibêje:`Kargeh sekinî ye, divê ez dîsa bizewicim`. Hevjîna wî 12 zarok anîne, ew bi sala ye ku berpirsyartiya her tiştî rakiriye, piştî nema dikare zarokan bîne li gorî hişmendiya mêr êdî nema bikêrî tiştekî tê. Wextê wê bi dawî bûye, hevjînê wê êdî wê weke xwişk nêzî wê bibe û biçe bi jineke temen biçûk re bizewice. Ew jî wê neviyên xwe xwedî bike heyanî ku bimre.

Bê guman rewşa ku jin dikeve tê de tenê mêr ne berpirsyare, jin jî bi heman awayî berpirsyar e. Gelek sedem hene ku heyanî niha diyardeya tûndiya li ser jinê berdewam dike. Jin, civak, mêr hemû berpirsyar in. Lê belê eger jin li bendê bimîne ku civak û mêr xwe biguherînin û rast nêzî jinê bibin, tucarî pirsgirêka zayendperestiyê nayê çareser kirin. Ji bona ku hişmendiya mêr were guhertin divê jin destpêke biryara têkoşînê bide û bixwe bibe hêza çareseriya pirsgirêkên xwe.




# Tabloya navdar “Qêrîn”

Tabloya Qêrîn yek ji tabloyên herî navdar yên cîhanî ne, ku di sala 1893’an de ji aliyê wênesaz Edvard Munch ve hate xêzkirin. Tê de rewşeke derûnî a xerîb û xerab a ku nivîskar têre derbas bûyî nîşan dide.

**Deriya Çiya/ Qamişlo**

Hunermendê Norwêcî Edvard Munch yek ji hunermendên nûjen ên herî girîng tê hesibandin. Karîyera wî di hunerê de ji destpêka sala 1880’an de heya mirina wî 60 salî dom kir. Wî bi wêrekî di warên wêne, grafîk, peyker û wênekêşiyê de ceribandin çêkirin. Ji destpêka sedsala bîstan de bû pêşengê hunera derbirînê. Tabloya “ Qêrîn “ ( 1893 ) berhema herî navdar a Munch e. Di nav rêze tabloyan de bû ku hunermend navê “Firîza jiyanê “lê bikê, ku tê de mijarên jiyan , evîn , tirs, mirin û bêhêvîtiyê serdest bûn. Wekî piraniya karên wî yên din, wî gelek nusxe ji wêneyê xwe re çêkirin. Ya yekem di sala 1994’an de û ya din jî di 2004’an de hatin dizîn, ku her du jî di dawiyê de hatin bidestxistin. Mijarên “Firîza jiyanê “ di piraniya berhemên din ên Munch de jî serdest bûn, wek: “Zarokê Nexweş”, “vexwarina xwînê”, “xwelî” û “Pirek”.



**Edvard Munch kî ye?**

Edvard Munch di sala 1863’an de li Oslo, paytexta Norwêcê, di malbatek ku endamên wê bi dîndariya xwe ya tund dihatin nas kirin, ji dayik bû. Bavê wî di artêşê de doktor bû, Xirîstiyaniya wî ya hişk hişt ku tovên xemgîniya olî di giyanê ciwan Edvard de biçînin. Munch paşê di bîranînên xwe de nivîsand:” Firuştên tirs, poşman û mirinê ji roja ku ez ji dayik bûme dora min girtine û di tevahiya jiyana min de dev ji hejandina min bernedan. Ew li kêleka min rawesta bû, dema ku min çavên xwe girtibû, bi kuştinê, dojehê û bi naleta ebedî gef li min dixwar”. Edvard kesek bi fikar bû, dema temenê wî 5 sal bûn diya wî bi nexweşiya sil çû ser dilovaniya xwedê, li pey xwişka wî Sophie di sala 1877’an de, ku hîn ne çardeh salî bû çû ser dilovaniya xwedê, paşê bavê wî mir û xwişka wî, Laura, dîn bû û di saziyek derûnî de hate pejirandin.

Munch di berhemên xwe yên dramatîk de, ew hestên ku zarokek ji tiştên ku diqewimin bandor bûne vedibêje. Bîranînên nexweşiyê, paşê mirina dê û xwişka xwe.

Piştre, Munch biryar da ku bibe wênesaz. Wî “studyo” li taxa bohemî ya Osloyê kirê kir û dest bi karê wênesaziyê kir.

**Şîroveyên tabloyê**

Şîrovekirina tabloyan li gorî hejmara temaşevanan diguhere, her yek tiştekî dibîne ku dibe ji hev cuda be, lê wateya giştî ya her tabloyê heye û ev tablo li gorî pêkhateyên wê yên bingehîn diyar dibe, wekî wateya tirsê, tirsa giran, êşa derûnî û tenêtî. Li vir bi rengekî tund, afirîner û şêrîn xuya dike. Rûyê ji tundûtûjiya tirsê dirêj û xwar bûye, taybetiyên rû bi rengekî şêrîn, wek çav û poz vekirî ye û diqîre û bi destan guhên xwe digire, helbet hatina her du kesan dikare bêtir ji yek wateyî bi xwe re bîne û pira bilind û çol di bin wê de jî, ji bo ezman û xwezaya derdorê û rengên geş, xurt û tarî, ew atmosferek taybet, kabûs û xerîb didin, balkêş e ku hunermend di bîranînên xwe de wêneyê xwe wiha rave kir: “Wî qîrînek bi deng bihîst. Piştî ku wî hest bi tirseke giran û hestek xemgîn kir û rengê ezman guherî bû sor…” Ev hemî dişibin serpêhatiyek psîkotîk a tund û kûr, em nizanin gelo ev qîrînek kozmîkî ye ji ezman e? Yan ji kûrahiya derûniya mirovan e? An jî ev yek ji her duyan têkel e gelo ev hemû tirs ji ber qîrîna ku wî bihîstiye, ji ber wê jî qîrîna tirsê ya parastinê derxistiye. Ya girîng ew e ku hunermend bêyî hûrgilî, şîrovekirin û nezelaliyên derdora wê karîbû vê tabloyê biafirîne.

**Girîngiya tabloyê**

Ev tabloya xêzkirî wekî “teşekirina xemgîniyê ya nûjen” tê hesibandin û di mezadê de di Gulana 2012’an de de bi 119 mîlyon dolarî hate firotin, berdevkê Muzexaneya Munch, dibêje ku wêneyê Scream karekî hunerî yê nirxdar e rûyê wî hestên tirsê nîşan dide, li ser pirekê radiweste dema ku serê wî di destên wî de ye û ew qîrînek berdide, li hember paşperdeya teşeyên gemarî û rengên sor ên geş ne. Edvard Munch îkona panîkê ya hebûnê hilda li ser encamên mirina Xwedayê Nietzschean û berpirsiyariya dûv re jî danî ser milên mirovê Ewropî ku armanc û wateya jiyanê bibîne.

**Dizîna tabloyê**

Tablo di 12’ê Sibata 1894’an de, di nav 50 saniyeyan de hat dizîn. Di roja vekirina Olîmpiyadên Zivistanê ya 1994’an de li Lillehammer, du diz ketin pencereya Galeriya Neteweyî, têlikên ku tabloyê bi dîwêr ve girêdide birîn û birin. Li gorî raporê Tiştê ku malpera History behs kir, ku herdû dizan ev hevok li ser dîwar nivîsandibûn: “Hezar spas ji bo ewlehiya xirab”. Çend roj piştî diziyê, di 3’ê Adarê de herdû dizeyan daxwaza fidiye ye1 milyon dolarî li hikûmetê kirin, lê hikmetê tu bersiv nede ji ber ku tu delîl nebûn ku ev daxwaz rast e, di dawiyê de, polîsan çar perçeyên çarçoveya tabloyê li taxeke bakurê Osloyê dîtin, dibe ku ev peyamek nepenî bû ji bo daxwaza fîdyeyê. Di dawiyê de, di Çile 1996’an de, çar zilam bi diziyê hatin mehkûmkirin û ceza kirin, di nav wan de Pall Enger, ku di sala 1988’an de bi dizîna tabloya “ vexwarina xwînê” li Osloyê hatibû mehkûm kirin. Paş di 7’ê Gulana 1994’an de, tabloya herî navdar a Norwêcê, “Qêrîn” a Edvard Munch, li otêlekê li Asgardstrand bi qasî 40 kîlometreyan dûr Başûrê Osloya hat dîtin.

**Nusxeyên tabloyê**

Edvard Munch çar nusxeyên heman tabloyê, du nusxeyên rengîn û du nusxeyên bi pastel xêz kiriye. yek ji du nusxeyên ku bi pastel hatine zaz kirin di sala 2012’an de bi qasî 120 mîlyon dolar ji hêla karsazê Amerîkî Leon Black ve, di mezadê de Sotheby’s Impressionist and Modern Art hat firotin.

Dîroka çar nusxeyan

Nusxeye yekem – 1893.

Nusxeye duyemîn – 1893.

Nusxeye sêyem – 1895.

Nusxeye çarem – 1910.

Hêjayî gotinê ye ku Edvard Munch tabloya Qêrîn piştî serpêhatiyeke psîkolojîk a ku tê de derbas bûye xêz kiriye û di rojnivîska xwe de wiha nivîsiye: “Ez bi du hevalên xwe re di rê de dimeşiyam, piştre roj çû ava, hestek nexweş li min da. Ji nişka ve ezman bi rengê xwînê sor bû, ji ber vê yekê ez rawestiyam û xwe spartim ser têlekî li kêleka rê, û ez ji westanê ketim, paşê min li ewrên agirîn ên mîna xwînê û a şûr li ser zinara deryaya şîn a bajêr meyzandin, hevalên min meşa xwe domandin, lê ez li wir sekinîm, ji tirsa min qîrînek bêdawî di xwezayê de bihîst”. Lêkolîneran cihê bûyerên di wêneyê de naskirin, ku ew Oslford Bay e, li Oslo, başûrê rojhilatê Norwêcê ye.

## Têbînî

### Desteyên Çandê û Siyaseta Rewşenbîrî



Kemal Necim

Tê zanîn ku çand ji bo hebûn û geşbûn û pêşketina kesayet û gel û civakan pir girîng e, ji xwe çand bi xwe berhemeke mirovî û civakî ye. Lewma çand bi awayên xwe yê meteryal û giyanî, ji tevger, têkilî û çalakiyên civakî re rêbernameyek alîkar pêşkêş dike û li gorî vê yekê tevgerên civakî yên asayî ji tevgerên ku nayên pejirandin diyar dike.

Li gorî vê girîngiyê, sazûmanên civakî, yên mîna dewlet û hikûmetan, hewil didin ku xebat û tevgerên çandî di bin siya sazûmaneke bi hêz û têgihiştî pêk bînin. Ev dezgeh yan sazî weke wezaret dibe yek ji kabîneyên hikûmet û rêveberiyan û rêveberekî bi asta wezîr kar û barên wê saziyê birêve dibe. Erkê wê dezgehê jî, ango wezaretê ewe ku di civakê de pergalek nirxên çandî yên erênî saz bike, rê bide mirovan ku bigihîjin rêgezên bidestxistina zanînê, vekirina asoyên wan ku bi daneyên cîhana xwe ya hemdem re têkilî pêkbînin, dîrok û mîrateya xwe ya çandî têbighêjin. Her derfetan ji mirovan re pêk bîne ku hilbijartina azad bikin û mafê xwe yê pratîkkirin û hilberîna çandê bi dest bixin.

Wezareta Rewşenbîrî kar dike ji bo bilindkirina nirxên hemwelatîbûnê û kûrkirina dilsozî û nasnameya neteweyî û pêşxistina warên curbicur ên çandî û hunerî bi şêweyekî afirîner û nûjen û pêşxistina mirovên jêhatî û afrîner.

Ji bo pêkanîna van xebat û karan jî pêwîstî bi danîn û destnîşankirina siyaseteke rewşenbîrî ya li gorî rêgez û nirxên civakê heye, li gorî wê siyasetê jî plan û projeyên stratejîk û demdirêj bêne sazkirin.

Kesê ku van karan jî birêve bibe, ango em bêjin wezîrê rewşenbîrî, pêwîste mirovekî pêkhatî, rewşenbîr, afrêner be, pêwîsete haya wî/ê û nasîbûna wî/ê bi derdorên rewşenbîrî û tevgera rewşenbîrî ya wî welatî yan wê civakê re hebe û serxwestî arîşe û pirsgirêkên wa be da ku karibe siyaseta rewşenbîrî bi bername û pilan û projeyan birêve bibe û pêş bixe.

Li Rojava û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî di nava pergala Rêveberiya Xweser de saziyên ku erka wezaretan pêk tînin hene, weke deste têne nasîn, ji wan jî desteya çandê ye, ev deste li ser asta kantonan jî hene û desteya giştî jî li ser asta herêmê heye. Li gorî çavdêrî û şopandinê, heta niha hevserokên van desteyên çandê ne ji nava civaka rewşenbîrî ya herêmê têne bijartin û erkdarkirin, her wiha kesên ku têne erkdarkirin haya wan ji tevgera rewşenbîrî ya vî welatî tune ye, têkiliya wan û nasîbûna wan jî bi rewşenbîr û ronakbîrên herêmê re jî qels û kêm e. Pirê caran weke diyar dibe, erkdarkirina hevserokên desteyên çandê li gorî dabeşkirin û kota partî û pergalên hevparê rêveberiyê têne destnîşankirin, ne li gorî zanebûn û serwxtiya wan û jêhatîbûn û afrêneriya wan têne destnîşankirin.

Ji ber van sedeman jî ta niha mirov nikare behsa siyaseteke rewşenbîrî ya civaka herêmê bike. Her wiha ji ber van sedeman xebatên rewşenbîrî bi plan û projeyên qels û seranser birêve diçe. Kar û xebatên rewşenbîrî jî bi piranî ji hêla hin yekîtî û saziyên rewşebîran ve birêve diçe, ew jî bê plan û bê siyaseteke rewşenbîrî ya diyar pêk tên.

Ji bo ku ev rewş were derbaskirin pêwîste rêveberiya xweser dema ku rêveberên desteyên çandê erkdar dike guh bide van rêgez û egerên li jor hatine diyarkirin.

# Nexweşiya Laşmaniya dîsa belav dibe

Rêvebera beşê nexweşiya Laşmaniyayê Hêvîn Mîrza da zanîn ku wan bi alîkariya hinek rêxistinên tenduristiyê û keda ku hatiye dayîn li pêşiya belavbûna nexweşiya laşmanyayê heyanî astekî girtine. Lê ew bi tirs in ku ev nexweşî mayînde bibe.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Laşmaniya nexweşiyeke ku bi riya mêşê belav dibe, ev mêş bi çavan nayê dîtin û di dema rozêrînê de derdikeve heya berbangê digere. Ev mêş dema ku diçe ser laşê mirovan, hêka xwe di bin laş de bi cîh dike, piştî 15 rojan cihê wan hêkan sor dibe û paşê dibe nexweşî û êdî mezin dibe. Di dema ku hêk di hundirê laş de cihê xwe çêdike û ava dike, cihê wê naxure û ne jî lê xuya dike, lê piştî ku 15 roj derbas dibin cihê wê êdî xuya dike. Sedema yekemîn a vê nexweşiyê ava qirêj a di hindirê golan de kombûye û gemar bûye. Qutkirina ava çemê Xabûrê ji aliyê dewleta tirk a dagirker ve bû sedem ku ev nexweşî belav bibe û bigihîje asteke ku zêdetirî 10 hezar mirov bi nexweşiya Laşmaniya yê bikevin. Derbarê vê mijarê de jî Rêveberiya beşê Laşmaniya yê Hêvîn Mîrza ji Rojnemeya me re axivî.



**‘Ji ber lawaziya paqijiyê û xwe parastinê, laşmaniya belav dibe’**

Hêvîn Mîrza diyar kir ku laşmaniya nexweşiya serdemê ye û wiha got: “Di her serdemekê de gelek nexweşî derdikevin, laşmaniya nexweşiyeke ku di serdema me ya niha de derketiye. Ji dîroka 1`ê Tebaxa 2021`an de, heya roja me ya îro ev nexweşî belav dibe. Sedema ku ev nexweşî pir belav dibe ava qirêj e, di heman demê de qirêjiya derdorê jî bandoreke mezin li ser belavbûna nexweşiyê heye. Ji ber ku parastina derdorê ji qirêjiyê pir lawaz e, lewra nexweşiya laşmaniya ji nû ve zindî dibe.”

**‘Ji destpêka miha Heziranê ve heye niha zêdetirî 50 nexweş hatine derman kirin’**

Hêvîn di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “heya ku qirêj di derdorê de hebe û di heman demê de av neyê paqijkirin, bêguman wê ev mêş ji nû ve çêbibe û bi rengekî xurt belav bibe. Ji ber ku mala mezin a mêşê ava qirêje. Niha nexweş kêm bûne lê bi dawî nebûye, berê di rojê de me zêdetirî 400 kes derman dikirin lê niha di heftiyê de 50 nexweş tên derman kirin.”

**Çareserî**

Hêvîn da zanîm ku çareseriya bingehîn reşandina dermanên kuştina vê mêşê ye û wiha domand: “Çareya bingehîn reşandina dermanên ku van mêşan bi kuje, di vî alî de divê ku hemû sazî û rêxistinên mirovî ewe ku vê karesetê hîs bikin. Derman heye lê divê ku ev mêş were kuştin û bi dawî bibe. Herêma ku herî zêde ev nexweşî lê belav bû Til Temir e, her wiha êdî belavî gelek bajaran dibe. Lê wekî çareya alternatîf ava paqij e û herikîna ava çemê Xabûr e. Heya niha ji aliyê dermanan em zehmetiyan nakişînin, berê derman pir kên dihat peyda kirin, lê niha peydakirina derman hesan bû ye. Em bi hêvîne ku hemû kes xwe biparêze û rêxistinên eleqedar derman ji bo kuştina van mêşan belav bikin. Em wekî hemşîre spasiya her endam, hemşîre, rêveberî û her kesê ku dikaribû bi riya lêxistina derziyek û dayina dermanekî da ku rê li pêşya belavbûna laşmanyayê bigre, dikin. Ji ber ku ev nexweşî di zarokan û kesên temenê wan mezin de çêdibe. Em bi alîkarîdayîna hinek rêxistinên tenduristiyê û keda ku hatiye dayîn bi bi ser ketin û me karî ku em bibin bend li pêşiya belavbûna laşmaniyayê. Lê em bi tirs in ji niha û şûnde wê çi bibe û nexweşî derbasî asteke çawa bibe. Çawa ku me Corona 19 derbas kir, em bi hêvîne ku emê nexweşiya Laşmaniyayê jî derbas bikin.”

# Dayika mezin welat e!

**Volqan Elî**

Welat, ji bo mirov erd e, hewa ye, dar, ber, daristan, çiya… û hwd. yanî ji bo mirov her tişt e. jixwe pêşiyên Kurdan jê re gotine war. War û welat hema bêje tê heman maneyê. War, parçeyek ji hemû welatî ye.

Têgeha ‘welat’ û cih û war ne tenê ji bo mirov e. Ev, çawa ku ji bo mirov girîng bin ji bo heywan, nebat û heya bi her hebûnê. Di Kurdî de çîroka bilbilê heye, tê zanîn. Dibêjin, “bilbilê dikin qefeseke zêrînî de bilbil dibêje ‘ax welatê min” Pêşiyên me ne hema ji ber xwe ve ev gotin kirine. Belkî bi hezaran sal xweza û mirov şopandine heya ku xwe gihandine vê encamê. Di rastiya xwe de dibe ku ‘welatê bilbilê’ jî bi gotina moderniteya resmalî ‘ne ti war be’. Dibe ku hêlîn yan jî welatê bilbilê teht û zinarekî Xwedê be, lê dîsa jî ji bilbil re ‘ax welatê min e’. Çima? Ji ber ku ji wir e. Ji bilbilekê re ew tehta, ew kendala xweş e! Ji ber ku her tişt bi mercên xwezaya ku di nav de ye çêbûye, di heman demê de parçeyek ji wê ye.


Ji bo mirov jî ev hê zêdetir wisa ye. Mirov yan jî hemû zindiyên din girîngî didin cih, war û welatê xwe ji ber ku jê çêbûye, her tiştê wê jê ye… taybetmediyên welat pir dişibin yên dayikê, welat ji bo insan dayik bi xwe ye; dayika mezin e. Ji ber vê ji bo yên qîmeta dayika xwe nizane jê re dibêjin, “bê namûs, bêjî, bê dê û bav û hwd”.

Em van çima dibêjin? Ne ku hin kes nizanin, mirov dixwaze yek fêr bibe. Jixwe civak bi vê zanebûnê jiyan dike. Dibe ku kêm bîne ziman, zêde bîne ziman, bi Erebî yan bi Kurdî bîne ziman.

Ya din jî bi rastî jî hin hêz di xayintiya xwe de bûne pispor, em ji vê re tiştekî nabêjin. Yanî ne ku em rewa dikin, hema bila bikin. Na! Lê dirûtiya wan mirov dide fikirandin. Mînak, Rûdaw televziyona wê. Lazim dike mirov xelata dirûtiyê ya nolê ji van re bixwaze! Çima? Ez ne şaş bim yan Adar yan jî Nîsana vê salê bû. Di sîteyên xwe yên înternêtê de muhtelen jî di tw’yên xwe de digot “Selçûk Bayraktarê Erdogan, çend serleşkerên artêşa Tirk hatine çiyayê Metîna ji bo serdanê”. Wekî ku çiyayê Metîna taxeke Enqere yan jî Stenbolê be wisa ji rêzê, heta ku mirov hestê wan kêfxweşiyê jî hîs dikir. Lê bila! Hûn ê bêjin “ev tiştekî ji rêzê ye, ew şirîkateke ragihandinê ne û jixwe re nûçe çêdikin. Dibe ku mirov kêliyekê heq bide we. Lê eger Rûdaw û xwediyên wê Îngilîz be, ji Zelanda nû be dibe. Lê qaşo dibêjin “Em Kurd in’ û heft bavên Erdogan û Selçûk Bayraktar jî dijminê Kurdan e.

**Em ji vê re jî bêjin bila!**

Di vê mehê de artêşa Tirk bi sedan tang û cebilxane, malzemeyên leşkerî derbasî Başûr kir. Li Dihokê seytereyên-bendên asayişê danîn. Rûdawa me (!) çawa dide? Wekî ew bi xwe neviyên Bahçelî yan jî Erdogan bin bê xem, ji rêzê, jixwe re dîmenê artêşa Tirk didin. Ne bêje ‘artêşa Tirkan li vir çi dike, ev gundê min e, welatê min, cihê min e, warê min e’. li herêma Mêrdînê ji diya xwe re dibêjin ciya min- Na! Qet ti tişt tine!




Em van tiştan ne ji ber ku mirov wê hêviyê ji wan dike, dibêje. Ji ber dirûtiya wan e. Dirûtî çi ye? Ew çawa dirûtiyê dikin? Ka te çend mehan ji beriya vê digot “Selçûk Bayraktar (zavayê Erdogan) hatiye seredana Metîna –cih û warê Çiyayê Metîna cih û warê Mîtanniyan e- hatiye serdana leşkerên xwe yên li Metîna”. Niha jî bi artêşa xwe ve hat. Ev di mantiqa leşkerî de tiştekî ji rêzê ye. Yanî yek dijminê yekî/ê be, beriya pê ve were keşfa xwe dike. Diçe ser. Yanî yek dikare dirûtî li vê derê çi ye? Bi rastî dirûtî tine. Ji ber ku her kes karê xwe dike. Bi Kurdî dibêjin ‘Dijmin e, bê minet e’! Artêşa Tirk e. hewl dide dagir bike. Ragihandineke ne diyar beşeke ajansa Anadoluyê ye an na: Navê wê bes bi Kurdî ye. Mejiyê wê, nûçeyên wê yên MİT’a dewleta Tirk e. Dirûtî çi ye! Sibê du sibe ew ê bêje, min jî gotibû artêşa Tirk derbas bûye”. Dibe ku hinek ji me jî bawer jî bikin; yanî bi hestên me yên welatparêziyê dilîze! Rih dibe bihost, dijmin nabe dost!

**Xwenasîn**



## Girîngiya perwerdê ji bo civakê

**Rohat Bulut**

Perwerde ji bo civakekê jiyanî ye. Civaka ku ji perwerdeya xwezayî û ya zaniztî bêpar be di xwezaya xwe de ji civakbûyînê jî derdikeve. Ya girîng ew e ku ji bo perwerdeyek bi nirx xebat guherînî û mayînde bên pêşxistin. Lewre perwerdeyeke baş dê pêşerojeke baş jî bi xwe re bîn e. Civakeke bi perwerde dikare bi her awayî xwe pêş ve bibe û xwe biparêz e. Li vir em tenê behsa perwerdeya pîşeyî nakin. Perwerdeya ji bo mirov û civakê bi giştî ye. Beriya her tiştî jî di warê hişmendî de perwerde gelekî girîng e. Heke di mirov de hişmendiyeke mirov parêz, civakî, wekhev û demokratîk pêş nekeve gelekî zehmet e ku civakeke pêşketî, xwedî pêşerojeke azad û bi ewle pêş bikev e.

Di heman demê de mafê hemû welatiyan e ku ji xizmetên perwerdehiyê sûd werbigirin û divê polîtîkayên perwerdehiyê di asta neteweyî de bên diyarkirin. Lê belê, divê karûbarên perwerdehiyê bi nêzîkatiyek ku pêşveçûna herêmî û hewcedariyên herêmî dihesibîne were meşandin. Ji xeynî zanîngeh, dibistana bilind û saziyên perwerdehiya taybet, veberhênan û plansaziya perwerdehiya seretayî û amadeyî divê di daraza rêveberiyên herêmî de be û peywira wan be.

Di heman demê de li vir erk û peywira şaredariyan jî girîng e. Wekî her saziyên civakî bi taybetî di warê xizmet û afirandina derfetan de şaredarî xwedî derfet in. Divê şaredariyên bajar û navçeyan bi taybetî ji perwerdehiya pêşdibistanê, qonaxên piştgirî û perwerdeya pîşeyî berpirsyar bin. Li gel perwerdehiya pêşdibistanê, piştgirî û perwerdehiya pîşeyî ya ku ji aliyê şaredariyên navçeyan ve ku yekeyên herî nêzî welatiyan in, bê dayîn, divê şaredarî di mijarên wekî çûn û hatin, xwarin û dabînkirina alavan ên girêdayî qadê de xebatên asankariyê bi rêxistin bikin. Her şert û mercên ji bo perwerdeyê bên veqetandin, di bingeha xwe de ji bo pêşerojê ye. Ya girîng jî ew e ku bi awayekî bê pere yanî bêheq be û her kes dikaribe jê sûdê werbigre.

Bi taybe jî dema ku mirov li rewşa heyî pergalên hegemon û rêveçûnê dinêre pir işkere dixuye ku pêwîstiya herî mezin perwerdeya civakê ye. Li hemberî rewşeke wiha encax mirov dikare bi perwerdeyê pêşî lê bigir e. Perwerde li gel ku dikare pêşî li pêşerojeke wekhev, demokrat û azad vebike jî di heman demê de dikare pêşî lê bigire.

Em tenê ji bo berjewendiyên civak û mirovan nefikirin. Di heman demê de divê bi pêşketina hişmendiyeke ku adilane ya ku mafên hemû zindîwarên heyî bibîn e û çavdêriyê li ser bike pêş bikev e. Di hişmenediya ku li ser vê perwerdehiyê bê avakirin de divê hemû xweza bê fikirîn û nêzîkatiyeke ku hemû mafên zindîweran wekî yên xwe bê nîşandin. Heke di wê perwerdehiyê de parastina xweza û zindîwerên din nebe dîsa dê aliyê wê yê jiyanî kêm be û nebe. Civak û mirov parçeyek ji xwezayê ye, heke parastinek xwezayê bi hişmenediyeke giştî ya perwerdekirî nebe dê ew civak û mirov jî veguhere rewşa zindîwerên din ên li xwezayê.



# ‘Azadiya Rêber Apo armanca me ya sereke ye’

KCDK-E’yê konferansa xwe ya dema navber temam kir. KCDK-E’yê diyar kir ku qirkirina gelê Kurd tê armanckirin û got: “Azadiya Rêber Apo armanca me ya sereke ye.”

**Navenda Nûçeyan**

KCDK-E’yê di daxuyaniya xwe de got: ‘’Di konferansê de ku bi şîara “Avakirina Civakî” pêk hat, weke armanca sereke biryar hate dayîn ku di serdema nû de hemleya ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê birêvebirin, were berfirehtirkirin. Konferans bi şîara; ‘Werin em bi felsefeya Rêber Apo civaka demokratîk ava bikin û bi hev re bi rê ve bibin”, pêk hat.

**Encamnameya konferansa KCDK-E’yê wiha ye:**

‘’Konferansa me weke siyasî di demeke pir girîng de pêk hat. Li aliyekî weke krîza pergala moderniteya kapîtalîst ya ji ber Şerê Cîhanê yê 3’yemîn ku weke navend li Kurdistanê û Rojhilata Navîn berdewam dike û li aliyekî jî dabeşbûna ku berfirehtir dibe, weke gefeke li ser jiyana gelan derdikeve li pêşiya me.

Di Şerê Cîhanê yê 3’yemîn de ku navenda wê Rojhilata Navîn e, dewleta Tirk jî roleke sereke dilîze û bi hemû hêza xwe seferber bûye ku li dijî gelê Kurd qirkirinê pêk bîne. Dewleta Tirk êrîşên xwe yên dagirkeriyê bi piştevaniya ku ji qada navneteweyî distîne, berdewam dike.

Dewleta Tirk a qirker ev şer li gel hêzên hevkar û dewletên herêmê derbasî qonaxeke din kiriye. Bi standina piştevaniya tam a hêzên PDK’ê îmhaya gerîlayên azadiya Kurdistanê tê armanckirin. PDK’ê hema weke şaxeke dewleta Tirk kar dike û ji bo vê yekê hemû hêza xwe seferber kiriye.

**Armanca sereke azadiya Rêber Apo ye**

Di konferansê de rojeva me ya sereke rewş û azadiya Rêber Apo bû. Şerê ku dewleta Tirk li gel hêzên moderniteya kapîtalîst li dijî fikir û paradîgmaya azadiyê yên Rêber Apo dimeşîne û agahînestandina ji rewş û tenduristiya Rêber Apo, fikarên me yên têkildarî vê mijarê gihandine astên herî bilind. Tevî van kiryar û tecrîdê jî fikrên Rêber Apo her roj li seranserê cîhanê pêl bi pêl belav dibin û di serî de ji jin û hemû civak û baweriyên li erdnigariyên cuda re dibin hêviyeke mezin. Girêdayî vê yekê pêngava ku di 10’ê Cotmeha 2023’yan de ji aliyê gelê Kurd û dostên wan ve hatî destpêkirin, her ku diçe mezintir dibe û berdewam dike.

Li gel nêzîkbûna 1’emîn sala pêngavê, di konferansê de biryar hate dayîn ku azadiya Rêber Apo ji bo hemû pêkhateyên KCDK-E’yê bibe weke armanca sereke û girêdayî vê yekê planeke ku hemû qadên xebatê di nava xwe de dihewîne, hatiye gotûbêjkirin. Bi berfirehtirkirina pêngavê bi rê û rêbazên nû û dewlemend plana bidestxistina armanca wê bingeha têkoşîna sala pêşiya me pêk tîne.




Konferansê avakirina civakî bi awayekî berfireh nirxand û li gorî vê yekê; KCDK-E’yê bi xebatên xwe di avakirina civaka demokratîk de encama ku dixwest, bi dest nexistiye, ferasetên kevn bi tamamî nehatine derbaskirin û ji ber vê yekê îradeya demokratîk a civakê asta ku dixwest, dernekeтiye holê û li gel vê yekê bi projeyên demokratîk berê civakê bi temamî ketiye pergala meclîs û komûnan û mesafeya her ku diçe zêde dibe ya di navbera me û gelê me de hatin nirxandin.

Derketiye pêş ku di mijarên weke jinûveavabûn û avakirina civakê de her kes di xebatên xwe de weke kiryar û kedkarên xebatên xwe ye.

Gelê me da xuyakirin ku ew dikare xwe di navendên civakî de birêxistin bike. Weke siyasî, civakî, aborî, çandî û di hemû qadan de xwe û pêdiviyên xwe bi proje û saziyan pêş bixe, bi xwe biryarên xwe dibe û xwe bi rê ve bibe û civaka ekolojîk û ya azadiya jinan esas digire ava bike.

Rexneya ku di konferansê de hatî kirin û tespîta sereke; kêmasiyên hevserokan yên têkildarî mijara fêmkirin û pêşxistina paradîgmaya Rêbertî, li pêşiya avabûna pergalê asteng in û dikevin pêşiya civakîbûna pergalê. Rêya çareserkiriya vê yekê jî pêşxistina paradîgmaya neteweya demokratîk û di hemû qadên têkoşînê de weke rênîşanderekê esasgirtina wê ye. Tekane çareserî bi pêşxistina şoreşa zîhniyet û wijdanê bûna civakeke ku birêvebirina xwe di destê xwe de digire.

Konferansa me bi awayekî zelal nîşan daye ku ji van hemûyan ders werin standin û guherîn û sererastkirin werin esasgirtin.

Di konferansê de ji bo pêkanîna avakirina civakî û bidestxistina armancan hatine diyarkirin bi şîara ‘Divê em xwe bigihînin hemû Kurdistaniyan’ seferberiya birêxistinbûn û endambûna hemû Kurdistaniyên li derveyî welat a di Navenda Civaka Demokratîk û Meclîsan de hatine dubarekirin.

Bi vê armancê di serî de di warên weke perwerde, ekolojî, werzîş, dîplomasiya gel, çand û aboriya komunal de û di mijarên heman de pêşxistina projeyan û girêdayî vê yekê di pêşerojê de di çarçoveya neteweya demokratîk de pêşxistin û birêxistinkirina civakê weke armancên pratîkên şênber hatine diyarkirin.

**Dê li Ewropa bibin hêza bi bandor**

Qedexeyên krîmînalîzekirina Kurdan, li Elmanyayê destpê kir û li Ewropayê kete meriyetê. Gava destpêkê ya van qedexeyan, têkoşîna azadiyê ya rewa û bimaf a gelê Kurd bi pênaseya ‘terorîzmê’ krîmînalîze kiriye. Li Ewropayê hejmara Kurdan hema bêje ji 3 milyonê derbas kir. Ev zext û qedexeya ku li ser gelê Kurd tê meşandin, pêkanîneke antî-demokratîk e û ji ber vê neheqiya gerdûnî dewleta Tirk bi salane li Kurdistanê komkujiyê pêk tîne û li pêş çavê cîhanê Kurdistanê dagir dike û gelê sivîl qetil dike.

Tê xwestin ku pêşî li rêxistinbûna Kurdistaniyên li dervey welêt dijîn, bê girtin. Lewma hatiye destnîşankirin ku hemû sazî û pêkhateyên me yên li dijî krîmînalîzasyonê têkoşînê didomînin, divê di heman demê de hemû derfetan binirxînin û li Ewropayê derfetên bûyîna hêza polîtîk a bibandor, bi rengekî herî baş bi kar bînin.

KCDK-E rêxistina sîwana yekîtiya civakî û neteweyî ya gelê me yê ji Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê koçî Ewropa û hemû cîhanê kirî ye. Girîngiya rolê pêşeng a KCDK-E’yê hate dubarekirin ku ji bo li ser bingehê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û çareseriya pirsgirêka Kurd, li hemû qadan têkoşîna demokrasî û azadiyê were pêşxistin. Sala dawî koçberiyeke zêde ber bi derveyî welat ve hate kirin, ji ber vê jî em neçar in bi vê rola xwe rabin.

Di konferansê de di çarçoveya nirxandinên siyasî û rêxistinî yên hatine kirin de, di serî de pêngava azadkirina Rêber Apo di pêvajoya li pêşiya me de li ser bingehê avakirina civakî têkildarî hemû qadên xebatê, biryarên berfireh hatin dayîn û têkildarî sala nû ya têkoşînê biryara planeke berfireh hate dayîn.

Weke encam; mezinkirina pêngava ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo hatî destpêkirin, mezinkirina xebatên ku li her deverê nûneriya gelê Kurd dikin, belavkirina xebatên çandî û armanca hembêzkirina ciwanan a di spor û hemû qenalên din de, li pêşiya me disekine.

Her wiha di derbarê rewşa rêbertiyê de parêzerê Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan Îbrahîm Bîlmez, anî ziman ku wan di konferansa Cenevreyê de tecrîda ku sînorê îşkenceyê derbas kiriye vegot û bang li hemû rêxistinên hiqûq û mafên mirovan kir ku gavan bavêjin.

Tevgera Dostaniya Navbera Gelan a li dijî Nijadperestiyê (MRAP), di çarçoveya Rûniştinên Mafên Mirovan ên 56’emîn ên Konseya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî (NY) de, di 3’yê Tîrmehê de li Ofîsa Cenevreyê ya Neteweyên Yekbûyî, bi sernavê “Li Tirkiyeyê mafên mirovan” konferans pêk anî. Ji parêzerên Buroya Hiqûqê ya Sedsalê Îbrahîm Bîlmez, Parlamentera Parlamenta Ewropayê Laûra Castel Fort û siyasetmedarên kurd Firat Anli beşdarî konferansê bûn. Nûnerê Daîmî yê Neteweyên Yekbûyî yê MRAP’ê Gîanfranco Fattorînî moderatorî ji konferansê re kir û destpêkê parlamenter Laûra Castel Fort axivî.

Endamê Buroya Hiqûqê ya Sedsalê Parêzer Îbrahîm Bîlmez, têkildarî naveroka konferansê û hewldanên parêzeran ên ku ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan li Ewropa pêş dixin agahî dan.

**Xwest Tirkiye deriyê Îmraliyê veke**

Bîlmez, anî ziman ku ji bo îşkence û tecrîda ku li cihanê mînaka wê tune bi dawî bikin, serî li hemû rê û rêbazan didin û wiha got: “Em serî li hemû saziyên darazê yên navdewletî didin. Di serî de em serî li DMME, CPT’ê û Konseya Ewropayê didin. Di sala 2022’an de jî ji ber ku me encam ji DMME û CPT negirt, me mijar bir rojeva Neteweyên Yekbûyî (NY). Me di sala 2022’an de serî li Komîteya Mafên Mirovan a NY’ê (KMMNY) da. Ev jî dadgeheke navneteweyî ye. Me mijara tecrîdê û şertên Îmraliyê li wir vegot. KMMNY’ê daxwaza me qebûl kir. Li ser daxwaza me di îlona 2022’an de ji hikûmeta Tirkiyeyê tedbîr xwest. Ji bo Abdullah Ocalan û girtiyên li Îmraliyê karibin bê sînor bi parêzerên xwe re hevdîtin bikin xwest deriyê Îmraliyê li parêzeran vekin. Lê Tirkiye gav neavêt. Li ser vê yekê me di meha çileya 2023’an de dîsa rewş ji KMMNY’ê re vegot. KMMNY’ê dîsa heman tişt ji Tirkiyeyê xwest. Lê Tirkiye dîsa gav neavêt. Heta niha ev daxwaz pêk nehatiye. Em bawer dikin ku KMMNY dê Tirkiye mahkûm bike. Aliyê hiqûqî û zagonî yê tecrîdê tune ye û di tu Peymanên navneteweyî de cihê tecrîdê tune ye. Tecrîda ku vegeriya ye îşkenceyê nayê qebûlkirin.”

**Li Îmraliyê her kêlî îşkence ye**

Prz. Îbrahîm Bîlmez, da zanîn ku tu di meha Gulanê de serî li Raportora Taybet ya NY’ê da. Yek jê raportora li dijî îşkenceyê bû. Yek jî Raportora Serxwebûna Pîşeyê Parêzeran bû. Me got 40 meh in em bi tu awayî agahî ji Abdulla Ocalan nagirin. Êdî sînorê îşkenceyê derbas kiriye. Dîsa muwekilê me ji 6 mehan carekê cezayê dîsîplînê digirin. Ev cureyê înfazê jî îşkence ye. DMME vê wekî îşkence pênase dike. Di sala 2014’an de piştî me serî li DMME’yê da û li ser vê yekê biryar da. DMME’ê biryar da ku Cezayê Muebeta Giran Îşkence ye û ev îhlala PMME’yê ye. Ji ber vê yekê ji 2014’an heta niha her saet Abdullah Ocalan di şertê îşkenceyê de dijî. Ji ber van mijaran me serî li Raportorê Taybet ê NY’ê da. Ji ber ku em parêzer nikarin erk û pîşeya xwe pêk bînin me serî li Raportorê Serxwebûna Pîşeyê Parêzeran jî da. Maqam û Erkdarên Darazê bi taybetî di 2-3 salên dawî de dixwazin me ji sînorê darazê dûr bixin. Ji bo em û malbat nikaribin biçin hevdîtina muwekilên xwe, cezayê dîsîplînê didin pêş me. Em nizanin çima cezayê dîsîplînê didin girtiyan. Vî cezayî ji me vedişêrin. Dîsa Dozgerê Bûrsayê ji 6 mehan carekê cezayê qedexeyê dide parêzeran. Peywir û pîşeya me ya parêzeriyê asteng dikin. Ji ber vê yekê me serî li Raportorên taybet ên NY’ê dan.”

Parêzer Bîlmez, da zanîn ku tev li konferansên NY’ê jî bû û ev agahî parve kir: “Demek dirêj e bi tevlêbûna sazî û rêxistinên civakî li Cenevreyê di bin banê NY’ê de civîn pêk tên. Ji bo em qala tecrîdê bikin di 3’ê Tîrmehê de bang li me kirin. Me ev pêvajoya ku li jor qal kir di konferansê de bi nûnerên sazî û rêxistinên civakî re parve kir û vegot. Divê hem NY û hem saziyên din ên cemawerî û rêxistinên demokratîk li dijî vê rewştê têkevin nava tevgerê. Me di konferansê de jî banga vê yekê kir. Nêzî 25 sazî beşdar bûn. Bi baldarî li me guhdar kirin û nîşe girtin. Parlamentera Parlamentoya Ewropayê Laûra Castel Fort li ser doza Kobanê, tecrîda Îmraliyê û destnedayîna parlamenteran rawestiya. Firat Anli jî li ser rewşa qeyûm û girtîgehan axivî.”

Girêdayî heman mijarê û ji bo azadiya Rêberê Gelan Abdullah Ocalan, bi pêşengtiya Tevgera Jinên Kurd a Ewropayê (TJK-E) kampanyaya nameyan a gerdûnî dewam dike. Di çarçoveya kampanyayê de, bi sedan nameyên bi îmze yên li welatên Îskandînav Swêd, Danîmarka, Norweç û Fînlandiyayê hatine komkirin, ji navnîşana CPT’ê re hatin şandin. Li ser navê meclîsên jinên Kurd, komûn û înîsiyatîfên li welatên navborî, daxuyaniyên hevpar hatin dayîn û hate destnîşankirin ku tecrîd nayê qebûlkirin.

Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku wê ji bo azadiya Abdullah Ocalan li her qadê têkoşîn were geşkirin û di serî de CPT bang li saziyên navneteweyî hate kirin ku berpirsyariyên xwe bi cih bînin.

# Desthilatdariya Hegemonîk a Navendî

**Ji remanê Rêber Apo**

Di çarçoveya mijara me ya bingehîn de danasîna teorîk a heyatî divê der barê desthilatdariya hegemonîk a navendî de hebe. Teoriya sereke ya karibe rewşa gelekî li ber qirkirinê zelal bike, teoriya desthilatdariya hegemonîk a navendî ye. Ji ber ku me têgîna desthilatdariyê têra xwe da naskirin, gelekî girîng e ku mirov diyar bike, bê ka desthilatdariyê di nava pêşdeçûna dîrokê de çawa civak kiriye nava pencên xwe. Berê pêşî divê mirov karekterê hegemonîk ê desthilatdariyê baş diyar bike. Navendên desthilatdariyê ji roja derketine holê û vir ve di nava xwe de hevrikiyê dikin û hinekî din pêşde diçin bivênevê şer dikin. Desthilatdarî di destpêkê de bi şeran hev tine dikin û bi vî awayî hewl didin monolîtîk û yekpare bibin. Piştî demekê tê fêhmkirin ku ev bêkêr û tewş e, herweha ne pêkan e. Lewma ketina bin hegemonya desthilatdariya navendî ya herî bi hêz ji bo navendên din ên desthilatdariyê weke ehwen-î şer ango ji xiraban a herî baş tê qebûlkirin. Herweha tevgerên antî-desthilatdarî yên ji jêr û ji derve timî tên, desthilatdaran neçar dikin ku li bin desthilatdariya hegemonê (domînant, fermandarê sereke) hevpariyê pê re dikin bi awayekî hevgirtî bimînin. Di dîrokê de xwerû desthilatdarî îstîsnayî ne; ya pîvan e, karekterê desthilatdariya hegemonîk e. Desthilatdariya navendî divê bi ekonomiya navendî re bê temamkirin. Desthilatdariya navendî ya xurtbûyî bi navenda ekonomîk a xurtbûyî ya sereke re di nava têkiliyeke xurt de ye. Ekonomiya navendî xwe xelek bi xelek li hawîrdorê belav û sîstematîze dike û vê yekê, divê bi desthilatdariya navendî re di zikhev de pêk bîne û belav bike. Ji ber ku desthilatdariya navendî bi xwe xurtbûyî ye, û potansiyela herî bi hêz a avahiya ekonomîk e, di nava aktualîteya xwe de aboriyê çalak dike û ji navendê ber bi derve belav dibe. Li gorî daneheva sermaye û hatina aborî, navend û hawîrdor timî cih diguherin. Ev rewş pêvajoyên ji wan re pêxîrtengî tê gotin ferz dike.



Naxwe hawîrdor û pêxîrtengî, xisletên bingehîn ên desthilatdariya navendî û ekonomiyê ne ku bêyî wan nabin. Heta sîstem bi berdarî bixebite hewcedarî bi guhertina navendê nîne. Lê çawa ku gelek caran di dîrokê de hatiye dîtin, wexta ku navend her diçe tiral û kurtêlxur dibe, hawîrdoreke berdar ji bandora pêxîrtengiyan keysê lê tîne derkeve holê û gav biavêje ango bi pêkanînên nû yên teknolojîk ekonomiyê serketîtir dike û vê yekê pêk tîne. Teknolojiya nû tê maneya teknîka nû ya eskerî. Di kêliyên wisa yên dîrokî de destguhertinên desthilatdariyê bi pêkhatinên nû yên navend û hawîrdorê bi encam dibin. Hegemonya desthilatdariyê ji nû ve ava dibe. Pêkhatinên desthilatdariya hegemonîk ên bi vî rengî di pêşengiya qewm û xanedanekî nû de derdikevin holê, di dîrokê de timî têne dîtin. Li vir, zêde manedar nîne ku mirov ji ekonomî û desthilatdariyê li ya diyarker bigere. Ti desthilatdariya hegemonîk bêyî navenda ekonomîk nikare bimeşe û ti navenda ekonomîk jî xwe li avakirina desthilatdariya hegemonîk a navendî ranekişîne nikare demdirêj mayînde bibe. Di dîrokê de diyardeyeke din a girîng bi desthilatdariya hegemonîk a navendî ve girêdayî ew e, ev sîstem xwedî xisleteke wisa ye, bi awayekî zincîrwarî bi sîstema desthilatdariyê ya beriya xwe ve girêdayî ye, û valatiyê qebûl nake, hem ji aliyê zeman û hem ji aliyê mekan ve qutbûn nîne, weke xelekên zincîrekê pêk hatiye. Di xwezaya desthilatdariya hegemonîk de ji aliyê zeman û mekan ve valatî, navberdan nîne. Berevajî ba di ber re naçe. Navber têra xwe tijî û bi hev ve ne. Xelek di zikhev de ne û hişk bi hev ve girêdayî ne. Eger qutbûn û navber pêk bê, heye ku navend hilweşe. Eger demeke dirêj neyê tamîrkirin û valatî neyê tijîkirin, hilweşîn û destguhertin bivênevê wê pêk bê. Divê mirov li desthilatdariyên hegemonîk ên navendî weke rewşeke bi tenê xweserî împaratoriyên mezin nefikire. Hewl didin tevahiya civakê bi têkiliyên desthilatdariya hegemonîk bi hev ve girê bidin. Ji navenda împaratoriya herî mezin heta bi yekeya malbata pêve girêdayî pîvanên hegemonîk ên bi heman rengî ji bo hemûyan dimeşin. Li Romayê împarator çi be, li gund axa û di nava malbatê de jî mêr ew tişt e. Civaka dîrokî bi girêkên hegemonîk ên bi vî awayî hatiye deribandin û eger ji nedîtî ve hatin, mumkîn nîne ku mirov civaka dîrokî fêhm bike. Belkî bi baran agahî û zanîna me hebe, lê wê serwextbûn û têgihiştina me ya diyalektîkî pêk neyê.

Divê desthilatdariya hegemonîk a navendî ne bi tenê bi ekonomiyê, lê bi hegemonya îdeolojîk a ku bi kêmanî bi qasî wê girîng e, bê temamkirin. Desthilatdariya hegemonîk a bê îdeolojî hegemonya xwe nabe. Nexasim gavavêtinên mîtolojîk û dînî yên bingehîn di qonaxa şaristaniyê de yan antî-hegemonîk in, yan jî bi kêmanî di demeke kin de bi baskekî desthilatdariyê re dibin yek û bi lez hegemonîk dibin. Nemaze mirov dikare ji pêşketina dînên yekxwedayî bi hegemonya navendî re gelek tiştan hîn bibe. Derketina wan a holê ji sedî sed bi hegemonyayê ve girêdayî ye. Têgîna Xwedê, Ellah yan alternatîfa hegemonê sereke ye, di vê rewşê de dîn muxalif û berxwedêr e, yan jî hegemon bi xwe tê pîrozkirin û wî dikin xweda; di rewşa duyemîn de dîn sîstema hegemonîk a navendî nîşan dide. Ji aliyê têkilî û nakokiyê ve di navbera herduyan de rewşeke heye ku pirr li ser şer tê kirin. Eger em dîroka dînên yekxwedayî bi desthilatdariya hegemonîk a navendî re lêkolin, em dikarin fêhm bikin. Naxwe bi awayekî din dîroka dînan nayê fêhmkirin. Dîrokeke dînan a ji bingehê ekonomîk û desthilatdariyê qut ji gotinên pûç û vala wêdetir tiştekî din nîne. Têkiliya di navbera dîn, xweda, hegemon, desthilatdar û ekonomiyê de ji pêşbînî û yeqînê heyî, zêdetir e. Çawa ku desthilatdariya hegemonîk bi awayekî zincîrwarî dor li zeman û mekan girtiye, dîn, xweda, hegemon, desthilatdarî û aboriyê jî di zikhev de dor li dîroka rastî girtine. Civaka dîrokî bi dorgirtinên bi vî rengî, bi awayekî xelekwarî xwe nîşan dide û tê heta roja me ya îro.

Em bi mînakan rewşê berbiçav bikin, ev pêvajo bi qasî tê zanîn ji hegemonê pêşî Qralê Aqadê Sargon ve bi awayekî zincîrwarî û bi awayekî xelekwarî heta roja me tê. Di roja me ya îro de jî ev pêvajo bi hegemonekî weke Împaratoriya Sargonê bi DYE'yê dewam dike û ev rewş di çarçoveya sîstema şaristaniya navendî de weke herikîna çemê sereke û mezin e. Hegemonya Sumer, Aqad, Babîl, Asûr, Hîtît, Mîtanî, Ûrartû, Med, Pers, Skender, Roma, Sasanî, Bîzans, Ereb-Îslam, Tirk-Moxol, Osmanî, Brîtanya û DYE'yê çemê sereke pêk tînin, Împaratoriyên Misr, Elam, Harappa, Çîn, Hind, Rûs, Frank û Germen rûbarokên tên ser vî çemê sereke ne. Eger mirov civaka dîrokî di tevahiya dîroka şaristaniya navendî de bi awayekî berbiçav weke çemê sereke û rûbarokên têne ser sembolîze bike wê bêhtir bi awayekî rastî were fêhmkirin. Bêguman rûbarok û şaxên hê piçûk ên vî çemê sereke û rûbarokên wî yên têne maneya çand û şaristaniyan hene. Ya girîng ew e, divê mirov fêhm bike ku pêşdeçûna dîrokê ji hev qut nîne, hegemonya navendî, ji bilî derbasbûnên di navberê de, hebûna xwe timî bi hêz kiriye û dinya roja me ya îro pêk aniye. Bêguman ev pêkhatin ne yekalî ye. Li aliyê din, hêzên antî-hegemonîk jî ji roja derketina holê ya şaristaniya navendî û vir ve li dijî sîstema wê û hêzên wê yên hegemonîk timî hebûna xwe pêk anîne, qutbê din ê dinyayê ango dinya şaristaniya demokratîk heta bi roja me ya îro anîne. Cewherê esasî yê vê dinyayê demokratîk, exlaqî û polîtîk e; bi konfederasyonên demokratîk ên naqedin timî xwe nû û bi hêz kirine, dinya xwe ya îdeolojîk bi giştî di nava dînan de û bi taybetî jî di nava mezhebekî dînên yekxwedayî de ava kirine û hêzên rastî yên hilberîner ên ekonomiyê ne, û ev rastî ne yên guftûgokirinê ne.

Herçiqasî modernîteya kapîtalîst bixwaze bi dîroka dewletên netewe ya dîrokeke taybet e, pêşdeçûna dîrokî gerdûnî ya hegemonya navendî bitepisîne jî nikare vê rastiya gerdûnî biguherîne. Dîroka gerdûnî nebe dîroka taybet jî nabe. Ya rastî, dîrok bi hevtemamkirina gerdûnî û taybet pêş dikeve. Dîrokên taybet ên netewe, çîn û xanedanan jî dîrokên şexsî di çarçoveya dîroka gerdûnî de neyên bi cihkirin nayên fêhmkirin. Modernîteya kapîtalîst dîroka xwe ya lîberal weke 'dawiya dîrokê' îlan dike û bi vî awayî hewl dide hîleya her serdema hegemonîk a klasîk serî lê daye, dubare bike. Her serdema hegemonîk xwe weke ya dawî îlan dike. Lê dîrok dewam dike. Belkî jî ya bi dawî dibe modernîteya kapîtalîst bi xwe ye. Bi serdema kapîtala fînansê ya global, ev sîstem bi xwe ti têkiliya wê bi dîroka berbiçav û civakê re nemaye û bêmane bûye. Ji aliyê şêwe ve jî roj bi roj ji hev de dikeve. Belkî jî di dîrokê de cara pêşî ye ku sîstema hegemonîk a navendî rezervên xwe qedandine û hêdî hêdî diderize, misêwa bi krîzê re di qirika hev de ne, û bi vî awayî nêzî dawiyê dibe. Bi xwe ji gelek aliyan ve li dawiyê dimîne. Cihê meraq û kakûniyê ye ku wê xwe bi qalibekî zirxî heta kengî biparêze; bi tinehesibandina zeman û mekan wê hebûna xwe bi awayekî şiklî bê dawî bike yan jî xwe biqedîne, ev mijarek e ku hêja ye heqîqeta wê were keşifkirin û were lêkolîn.



# Dagirkeriya Tirk ji destkeftiyên gelê kurd ditirse

**Bi hevkariya PDK'ê û bêdengiya hikumeta Îraqê, êrişên dagirkeriya Tirk yên li dijî Başûrê Kurdistanê bênavber dewam dikin. Berdevka PYD'ê Sema Begdaş diyar kir ku li hemberî destkeftiyên gelê Kurd êrişên dagirkeriyê zêde dibin û got, "Gelê kurd û Tevgera azadiyê bûye hêviya gelên azadîxwaz."**

**Amara Baran/ Qamişlo**

Êrişên dewleta Tirk yên li dijî Herêmên Parastina Medya li Başûrê Kurdistanê û Bakur û Rojhilstê Sûriyê bênavber dewam dikin. Di demên dawiyê de, bi hevkariya PDK'ê, dagirkeriyê jimareke mezin ji tang, top, erebeyên zirxî û leşkeran derbasî xaka Başûr kir. Li hemberî wê jî hikumeta Îraqê û tevahiya hêzên navneteweyî xwe bêdeng dikin.

Derbarê êrişên dewleta Tirk a dagirker, xiyaneta PDK'ê û bêdengiya hikumeta Îraqê ya li hemberî dagirkirina axa Başûr, berdevka Partiya Yekçtiya Demokratîk PYD'ê Sema Begdaş ji rojnameya me re axivî.

### Bi bidestxistina destkeftiyan êrişên dagirkeriyê zêde dibin

Sema Begdaş diyar kir ku ji bo pêkanîna êrişeke berfirehtir, dewleta Tirk hêzên xwe yên leşkerî yên li Başûrê Kudistanê roj bi roj zêde dike û wiha domandin: "Ev ne cara yekem e ku dewleta Tırk a dagirker bi hevkariya PDK'ê êrişî Qadên Berxwedanê li Başûr dike û hêzeke mezin ji artêşa xwe dişîne waê herêmê. Li ber çavê tevahiya cîhanê dagirkeriya Tirk bi 10'ê caran êrişî Qadên Berxwedanê li Başûr dike, li wir sînor derbas kiriye û cihê xwe ava kiriye. Lê herdem hikumeta Îraqê bêdenge û PDK'ê destkdayînê dide. Her ku destkeftiyên gelê Kurd zêde dibin, êrişên dewleta Tirk yên li dijî gelê kurd jî zêde dibin. Di roja



îro de jî, dagirkeriyê hemû hêza xwe ya siyasî, dîblomasî, aborî û leşkerî ji bo têkbirina gelê kurd û Tevgera Azadiyê, xisteye dewrê."

### Dewleta Tirk bûye faşîsta sedsala 21'mîn

Sema Begdaş da zanîn ku dewleta Tirk faktoreke bingehîne yê têkbirina ewlehiya Rojhilata Navên e û wiha got: "Di giştî Rojhilata Navîn de, herwiha bi taybet li Kurdistanê, dewleta Tirk binpêkirinên xwe dewam dike û aramiya herêmê têk dibe. Dewleta Tirk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Başûrê Kurdistanê gelek herêm dagir kirine. Dewleta Tirk bi kiryar û binpêkirinê xwe bûye faşîsta sedsala 21'emîn. Li hemberî wê jî yê ku berxwedanê dike Tevgera Azadiyê û gelê kurd e. Lê mixabin dixwazin bi riya bazaran Tevgera Azadiyê tesfiye bikin. Lê bi berxwedaniya Tevgera Azadiyê planên wan herdem têk diçin. Dewleta Tirk her ku planên wê yên dagirkirinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê têk diçe, êrişî Qadên Berxwedanê li Başûr dike."

Dagirkeriya Tirk bi hemû hêza xwe hewil dide şoreşê têk bibe

Sema da xuyakirin ku dewleta Tirk Ji destpêka avakirina xwe ve û heta niha her tim ji bo qirkirina gelê kurd hemû rêbazan bikar tîne û hewildanên xwe dike, lê îro em dibînin di vê sedsalê de li serasnerî cîhanê doz û têkoşîna gelê kurd ya ji bo azadî û demokrasiyê deng vedaye. Herwiha têkoşîna jinên kurd ji tevahiya jinên cîhanê re bûye sembola azadiyê. Berxwdana bêhempa ku gerîlayên azadiyê didin meşandin ji tevahiya gelên azadîxwaz re bûye hêviya azadiyê. Ji ber vê yekê, çiqas destkeftiyên gelê kurd zêde dibin û serkeftinan wan mezin dibin, êrişên dewleta Tirk a dagirker jî zêde dibin. Dagirkeriya Tirk ji destpêka şoreşa 19'ê Tîrmehê ve êrişên ser herêmê nedane rwestandin, li hemberî projeya Netewa Demokratîk êrişên xwe zêde dike û dixwaze vê projeyê têk bibe."


### Wê êrişên dagirkeriya Tirk dewam bikin

Sema Begdaş di dewama axaftina xwe de wiha got: "Dewleta Tirk siyaseta qirkirina gelê kurd dewam dike, dema di milê leşkerî şikandinan jiyan dike û bibin dikeve , bi riya şerê taybet û MÎT'ê pêşengên gelê Kurd û şoreşa 19'ê Tîrmehê dike armanc. Di sedsala 21'emîn de li Kurdistanê û tevahiya Rojhilata Navîn gelên bindest li azadiyê digerin, di nava ewqas pevçûnan de gel dixwazin bi azadî jiyan dikin û ji bo vê yekê li projeyekê digerin ku cihê xwe tê de bigrin. Yê ku pêşengiya vê projeya azadiya gelan dike gelê kurd e, ji ber wê gelê kurd ji bo tevahiya gelên bindest bûye hêviya azadiyê. Ev jî dihêle em wekî gelê kurd erk û berpirsyartiya me mezintir bibe. Gelê kurd di hemû şêwazên qirkirinê û komkujîyan re derbas bûye; qirkirina siyasî, dîblomasî, Çandî, lê nehatiye pişaftin û xwe parastiye. Projeya Netewa Demokratîk ku bi awayekî pratîkî îro li Bakur û Rojhialtê Sûriyê tê meşandin, dikare bibe proje û çarenûs ji bo gelê kurd yên li her çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê. "

### Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek gavên girîng hatine avêtin

Berdevka Partiya Yekîtiya Demokratîk Sema Begdaş axaftina xwe wiha qedand: "Di warê siyasî û dîblomasî de gavên girîng hatine avêtin, gelek destkeftî jî hatine bidestxistin. Helbee Ev hemû encama ked, berxwedan û fikreke mezin bû, em îdeolojiyeke rast li gor vê sedsalê guncawe ji bo her kesî li ser pîvanên ekolojîk, azadiya jin û biratiya gelan didin pêş, îro em vê têkoşînê dikin. Ji ber vê pêwîste ji bo me weke gelê kurd bi giştî, em li ser pîvan û pernesîbên ku karîbûn destkeftiyên gelê kurd li her çar parçeyên Kurdistanê biparêzin, yekîtiya xwe xurt bikin û têkoşîna xwe mezin bikin. Pêwîste tevahiya gelên herêmê bi yek helwestê li hemberî dagirkeran bisekinin."

## Aştiya Erdogan



**Zekî Bedran**

Erdogan weke ku tiştek nebûye gotinên "Em hertim destê xwe dirêjî cîranên xwe dikin. Eger Esad bipejirîne emê wî vexwînin. Em berê ne dijmin bûn, em bi malbatî dihatin gel hev." Ev ew Erdogane ku li qadan tu nedima ji Esad re nedigot. Ji gotina "Ew kujerek e. Zilmê li gelê xwe dike" îro hatiye wê rewşê ku dixwaze hevdîtinan pêk bîne. Erdogan ku ne erka wî bû û pêwîstî pê nebû, dijminayiyek bê sînor ji Sûriyê re kir. Sînorê xwe ji çekdarên DAIŞ û El- Qaîdeyê re vekir. Sûriye xist nava zivrînokek bi xwîn. Tevahî karxaneyên bajarekî weke Helebê ji cihê wan rakir û veguhaste Tirkiyê. Bi DAIŞ'ê re petrol û bermayên dîrokî dizî. Bi kurtayî bû sedema hilweşandina Sûriyê. Bû sedema penaberbûna bi milyonan mirov, milyonek mirov mirin û birîndar bûn.

Weke ku ev têrê nakin, artêşa Tirk xistin Sûriyê û herêmek berfireh dagir kirin. Bi dagirkirinê jî têr nebûn. Cihên Kurdan ên dîrokî ji Kurdan vala kirin, paqijiya nîjadî pêk anîn. Mal û milkê gel talan kirin. Bi vê jî têr nebûn. Li dijî artêşa Sûriyê "Artêşa Netewî ya Sûriyê" û li dijî hikumetê jî "Hikumeta Demkî ya Sûriyê" ava kirin. Hîna ev hene, di demeke wiha de ji Esad re dibêje were em aştiyê çêbikin.

Kesekî ku dixwaze aştiyê çêbike, qet nebe ji bona van kiryarên xwe lêborînekî dixwaze, beşek ji zirarê bi tezmînatê dide. Lê Erdogan dibêje ez ji Sûriyê dernakevim. Heman demê de hewl dide rêveberiya Esad bikişîne nava şerekî din ê navxweyî. Erdogan giranî daye perçiqandina Kurdan û ji holê rakirin. Ji bo Efrînê bi Rûsyayê re û ji bo herêmên din bi rêveberiya Trump re lihev kir û dagir kir. Heta niha nekariye bi tena serê xwe Kurdan ji herêmên din rake. Artêşa xwe xistiye Iraqê, li wir jî bi tesfiyekirina gerîlla re mijûl e. Dixwaze ji pêşketin û aloziya li herêmê sûdê bigire, bi piştgiriya Rûsyayê re bi Esad re li hev bike û li Sûriyê Kurdan tune bike.

Eger baldarbin, daxwaza wî ya ji bo hevdîtina bi Esad re ne ji bo kiryarên xwe rawestîne û sererast bike ye. Nekarî Esad tune bike. Rêveberiya Esad bi piştgiriya Îran û Rûsyayê li ser piyan ma. Hêzên rojavayî jî nabêjin bila Esad biçe. Dema dît ku Esad mayînde ye, hewl dide tunekirina Kurdan di ser Esad re pêk bîne. Eger Erdogan cidiye, pêwîste destpêkê ANS'yê ku li dijî Esad rêxistin kiriye têk bibe. Pêwîste dawî li Hikumeta Demkî ya Sûriyê bîne yan jî ji herêmên bin destê xwe de derxe. Lê vana nake. Wan jî di destê xwe de digire û li dijî Esad weke kaxezek a bazarê bikar tîne. Helbet dema cihê wê hat û ji berjewendiyên wî re xizmetê bike dê van komên jêre dibêje muxalîf bixe bazarê û bifroşe. Tişteke ku Erdogan nefroşe tune ye, ne girêdayî tu nirxan e. Hevalên xwe yên ku bi hev re partî avakirin jî avête aliyekî. Tiştên ku bi serê hevkarê wî F. Gulen hatî li holê ye. Bi Ergenekonperestên ku xistibû girtîgehê re lihev kir û bi MHP'ê re hevkarî çêkir. Erdogan li kêleka tunekirina Kurdan, dixwze ji milyonan penaberên li Tirkiyê jî xilas bibe. Ev penaber heta dawî bikar anîn. Ew li hemberî Ewropayê weke çek bikar anîn. Bi milyonan Euro pere girt. Ev penaber li Tirkiyê weke hêza erzan a kar bikar anîn. Ji bo çeteyan weke depoya berhevkirina çekdaran bikar anîn. Ev çete şandin şerê ji Libyayê heta Azerbeycanê. Herêmên dagirkirî ji DAIŞ û komên çete re kire herêmek parastinê û qada xwebirêxistinkirina van koman. Bi kurtayî Tirkiye kir cihê hilberandin û şandina terorê ji bo cîhanê.

Bêguman Sûriye di rewşek zehmet de ye. Erdogan vê weke derfet bikar tîne û teklîfê li Esad dike. Rûsya navbeynkariyê dike. Rûsya jî li gorî xwe hesab hene. Naxwaze hîn zêdetir barê Sûriyê hilgire. Rêveberiya Esad jî ne gelparêz û demokratîk e. Ew jî desthilatê û berjewendiyên xwe esas digirin. Lihevkirina Esad bi Erdogan re dê ne balkêş be. Rêveberiya Esad heta niha liberxwe da. Digot, heta Tirkiye dawî li dagirkeriyê neyîne em pêre rûnanin. Lê pêwîste em li bendê nemînin ku dê hertim helwestek wiha dane. Rêveberiya Iraqê jî li hemberî dagirkeriya Tirk nedisekinî. Lê qet nebe car caran nerazîbûn nîşan dida. Vê salê Erdogan teklîfên nû ji Iraqê re birin, hevdîtin pêk anîn, hikumeta Iraqê niha ji dagirkeriyê re bêdeng e û zemîn ava dike. Rêveberiya Esad çûye Tirkiyê, gelo amedeye bi milyonan penaber bigire? Na. Li holê bingehek aborî tune ye. Tirkiye jî hesab dike ku bi kevirekî li çend çûkan bide. Hem dixwaze ji penaberan xilas bibe hem jî di avabûna Sûriyê de ji çavkaniya sûdê bigire. Eger bi Esad re aştiyê çêbike, dê tiştan bifroşe wan û ji mutahîdên xwe re parê bistîne. Xwepêşandan û bêzariyên çeteyên li herêmên dagirkirî sedema wê ewe ku çete dizanin dê wan jî bixin bazarê. Tişta ji Kurdan re jî dimîne êrişên nû û tesfiye ye. Ev jî bibe encama aştiya Tirkiyê. Lêgerînên demokratîk û berdêlên ku gelê Sûriyê jî dane dê berhewa biçin.

## Bikaranîn-bikarneanîna zimanê Kurdî



**Farûk Sakik**

Çend roj in li Almanyayê Li bajarê Kolnê, li nexweşxaneyekê terapî dibînim. 4 bijîşkan Kurd bi min re eleqeder dibin. Bi tedawiya min re ew mijûl dibin. Zimanê ku di tedawiya min de bi kar tînin Kurdî ye. Ew peyvên Latînî ji bo ku ez fam bikim çi xweş didan famkirin. Ev yek bala min kişand û min xwest vê heftê nivîsa xwe bi van bijîşkan bidim destpêkirin. Ez ê balê bikişînim ser vê mijarė di van salan de gelek rexne li ser zimanê Kurdî hene da ku çima di jiyana rojane de nayê bikaranin.

Ez ê ji van 4 bizîşkan dest pê bikim. Bersiva vê pirsê di jiyana van bizîşkan de veşartiye. Ji Bakurê Kurdistanê, ji bajarên cuda ne. Di destpêka salên 2000'î de li zanîngehê bûne yanî zarokên salên 1990'î ne. Min ji wan pirs nekir ku ji ku derê fêrî Kurdi bûne. Ji bo ku min ji bersiva vê pirsê re şahidî kiribû. Şerê ku di sala 1984'an de destpêkiribû misyona xwe di salen 1990'î de de temam kiribû.

Di sala 1992'yan de bi vebûna Enstîtiya Kurdî, derketina rojnameya Welat re, bi weşanên Med-Tv û Roj Tv re û bi zêdebûna nivîsên Kurdî de, zimanê Kurdî jî pêş ket. Ev 4 bizîşk di salên zarokatiyê de di MED-TV û ROJ-TV de Mamoste Mahmûd Abê (Onder), Rêşad Sorgul û Mazhar Gunbat guhdar kirin, zimanê xwe pêş xistin. Xwendin tune bû, bi tenê guhdar kirin. Derbasî zanîngehê bûn. Bi xwendina kovar û pirtûkan dest pê kirin. Di dest wan de ferhenga Zana Farqînî û xebatên Samî Tan jî hebûn. Li gel wan di zimanê kurdî de roj bi roj pêşketin çêbû. Îroj ev 4 bizîşk Kurdiyeke pir paqij diaxivin. Ka civak dibêje; Kurdiya akademîk, belê bi wî awayî diaxivin.

Ev yek encama ked û têkoşînekê bû. Ji vê yekê re Tevgera Azadiyê pêşengî kir. Ev xebatên wê demê, xwedî qedir, qîmet û wateyeke girîng bûn. Bandora xwe jî hebûn. Di salên 1990'î de tiştek din jî hebû ku li wan bandor kiribû. Gund hatin şewitandın û Kurdan koçî bajêran kirin. Di kolanên bajaran de dengê zarokan bi Kurdî bilind dibû. Lîstikên wan, çêrên wan, kenê wan, pevçûnên wan bi Kurdî bû. Dema tu ji kolanan derbas dibû, te dengê "kurêêê kerê" sedî sed dibihîst. Ev yek hetanî sala 2016'an dewam kir. Bi şerê ku AKP'ê da destpekirin re, asîmîlasyon jî dest pê kir. Dest danîn ser hemû amûrên ku ziman pêş ve dixin. Hemû saziyên bi ziman re eleqedar in hatin girtin. Qîm nekir medya dijîtal ket dewrê. Me dikarîbû li gorî vê sîstemê tevbigeriyana lê nebû.

Îroj tv nayê temaşekirin, rojname nayên xwendin. Ev yek jî bandorê li ser gelek, rojnemevan nivîskar û rewşenbîran (yên Bakur) dike ku di medya dijîtal de zimanê Tirkî diaxivin. Hin kes jî li du reqaman ketine. Dibêjin; Kurdî di Youtubeyê de pere nake.

Baş e, ew ciwanên ku nû dest bi tibê kirine, wê bi vî zimanê Kurdî çawa fêr bibin da ku bi Kurdî xizmeta tibbî bikin. Bi dijmin re, me jî dijminatiya zimanê xwe kir. Wa dîsa ji welat xeber tên. Tê gotin ku zimanê Tirkî li kolanan serdest bûye. Êdî zarok li kolanan peyva "kurêêê kerê" bi kar anîn. Dewsa wê gotinê de, gotina "ulen oxlim" bi kar tînin.